# WÊNESAZÎ

## SERETAYÎ 6

2019/2020

## AMADEKAR

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Wênesaziyê ve hatiye amadekirin.**

## LÊVEGER

- **Komîteya Şopandinê**
- **Komîteya Fotoşopê**
- **Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK


BEŞA YEKEM: WÊNESAZÎ ..................................... 7
NÎGARKIRIN BI RÊYA PÊNÛSA RISAS ............. 8
XWEZAYA BÊDENG ............................................. 12
RENGÊN HEVBELÎKER ....................................... 17
NEXŞEYA ŞÎNATIYÎ ............................................. 20
TÎPÊN BI RÊBAZÊ 3D ........................................... 23
NÎGARKIRINA KESAYETÊN ÊNIMIYÊ ........... 26
HESP ............................................................. 28
ÇEM ............................................................. 31
CEJINA NEWROZÊ ................................................ 33
NÎGARKIRINA JI AŞOPÊ ..................................... 35
BEŞA DUYEM KARÊN DESTAN .......................... 37
KAREK JI KEVIRAN ............................................ 38
XEMILANDINA HÊKAN ....................................... 42
TEŞEYEK JI PELÊN QELAYÊ ............................. 47
XEMILANDINA QOTÎKEKÊ ................................ 52
XEMILANDINA QAPA LÊNÛSÊ .......................... 57
DAREKE JI TÊLAN ............................................... 61
QOTÎK Û NAMEDANKA DIYARIYAN .............. 64
KAREK JI HIRIYÊ ................................................. 68
KAREK JI DARIKAN ............................................ 73
MIJAREKE SERBEST ........................................... 78

## ARMANCA PERWERDEYÎ

## BEŞA YEKEM: WÊNESAZÎ

1. Karîna xwendekar ji şîrovekirin û xwendina çi karên hunerî yên li pêşberî wî.
2. Karîna xwendekar ji nîgarkirina mijaran bi xêzên guncaw.
3. Bikaranîna rengan bi awayekî guncaw ji mijarê re.
4. Dayîna nêrîna xwe li ser kevalên nîgarkirî.

1. Nîgarkirin bi Rêya Pênûsa Risas
2. Xwezaya Bêdeng
3. Rengên Hevbelîker
4. Nexşeya Şînatiyî
5. Nîgarkiria Tîpan bi Rêbazê 3D
6. Nîgarkirina Kesayetên Kartonî
7. Hesp
8. Çem
9. Cejina Newrozê
10. Nîgarkirin ji Aşopê



**WANE 1**

# NÎGARKIRIN BI RÊYA PÊNÛSA RISAS

**Armanca hunerî:**

**Fêrkirina xwendekar çawaniya bikaranîna pênûsa risas û naskirina pileyên wê.**

**Wênesazî\nîgarkêşî:**

Pîşeyek weke her pîşeyekê ye ku mirov dikare fêrî wê bibe. Wênesazî ne tenê ji bo kesên behremend e, lê belê her kesek dikare bi nîgarkirina rojane yan jî bi xweperwerdekirinê, fêrî wênesaziyê bibe.

**Pênûsa risas:**

Amûreke bi teşeya xwe lûleyî ye, di nivîsandin û nîgarkirinê de tê bikaranîn. Taybetiya vê pênûsê ew e ku jêbirina wê hêsan e.

**Du cureyên pênûsa risas hene. Ew jî ev in:**

**Pênûsa hişk:**


Ev cure ji bo xêzên zirav û zelal tê bikaranîn.

**Pênûsa nerm:**

Ji bo xêzên stûr û tarî tê bikaranîn.


**Em ji bîr nekin ku her pênûseke risas taybetî, jimar û tîpên wê hene û bi wan tê naskirin. Mînak:**

**H:** Ev cureya pênûsan hişk û zelal e, ango her çi qas pileyek lê zêde bibe zelaltir dibe, ta dighe **9H** ku ev cure kêmreng e û ji bo xêzên destpêkê yên zelal tê bikaranîn.




**B:** Ev cureya pênûsan nerm û tarî ye. Her ku pileya wê zêde dibe, tarîtir dibe; ta digihe pileya **9B,** ev pile pir tarî ye. Bikaranîna vê cureyê di kevalê de ji bo cihên siyê ye.


**HB:** Di vî cureyî de, pênûs ne hişk e û ne jî nerm e û rengê wê jî di navbera zelalbûn û terîbûnê de ye.




**Rêgezên nîgarkirinê bi rêya pênûsa risas:**

1. Hilbijartina teşeya ku em dixwazin nîgar bikin.
2. Bikaranîna pênûsa **2H** an jî pileyeke zelaltir, di xêzên destpêkê yên sereke de.
3. Divê em balê baş bikşînin ser nîgarê, ta ku em cihên sî û ronahiyê nas bikin.
4. Ji bo cihên siyê, bikaranîna **3B** a herî baş e.
5. Cihên ronahiya dijwar, bi temamî spî dimînin.

**Li vê nîgara li jêr binêre ku çawa di xêzên sereke de pênûs bi pileya 2H-3H û di cihên siyê de, bi pileya 3B-4B, hatine nîgarkirin.**



## RAHÊNAN:

1. **Em ê teşeyekê xêz bikin û van xalên li jêr pêk bînin:**
    - Divê em xêzên sereke bi pileya **H** nîgar bikin.
    - Piştî wê em ê cihên ronahî û siyê nas bikin, ta ku em ên bironahî zelal bihêlin û yên tarî bi pileya **B** tarî bikin.

**WANE 2**

# XWEZAYA BÊDENG

## Armanca hunerî:

**Naskirina xwendekar di rêya nîgarkirin û sîkirinê ji teşe, qebare û hûrguliyên hêmanên li derdora xwe.**

## Xwezaya bêdeng:

Her tiştên nezindî ango tiştên ku nalivin, weke firax, peyal, fêkî û hwd.




**Li vê kevala li jêr baş binêre.**


1. Me di vê kevalê de çawaniya belavkirina rast a hêmanan, nas kir.
2. Hevsengî û guncawbûna di navbera hêman û paşnîgarê de.
3. Her wiha, bikaranîna rast a pênûsan di diyarkirina cihên sî û ronahiyê di kevalê de.

**Ji bo ku em kevaleke xwezaya bêdeng nîgar bikin, divê em van xalan li ber çavan derbas bikin:**

1. Em di serî de hêmanan bi vî awayî nîgar bikin, heta ku em qebareya wan nas bikin û divê em pênûsê zêde nedewisînin, ji ber ku hin xêz hene em ê paşê wan jê bibin.




**2.** Em xêzên zêde jê bibin.




**3.** Nîşankirina aliyê ronahiyê di kevalê de.



4. Ji bo sîkirina hêmanan, divê em bi cihên zelal dest pê bikin, paşê em cihên siyê bi pileya **5B** tarî bikin. Her wiha divê em di vajîbûna şewqê li ser hêmanên weke kanza û camê de, balder bin. Bi vî awayî kevala me diqede



**Ev kevala xwezaya bêdeng a li jêr a nîgarkêşê Fransayî Poul Cezanne (Pawil Sîzan) e.**



**Poul Cezanne kî ye:**

Poul Cezanne (1839-1906) nîgarkêşekî Fransayî ye. Mijarên ku li ser wan keval xêz kirine ev in: xwezaya bêdeng, wêneyên kesayetan û dîmenên xwezayî.

**RAHÊNAN:**

1. **Hin hêmanan bi awayekî hevseng û hunerî deyne pêşberî xwe, heta ku tu nîgar bikî, lê ji bîr neke ku xêzên destpêkê bi pileya (H) tên nîgarkirin û cihên siyê bi pileya (B) tên tarîkirin.**

**WANE 3**


# RENGÊN HEVBELÎKER

## Armanca hunerî:

**Naskirina xwendekar ji rengên sereke, darîştî û yên hevbelîker re.**

## Rengên sereke:

Rengê **sor**, **zer** û **şîn** jêdera hemû rengan in; ji ber ku ji van her sê rengan, hemû rengên din saz dibin.




## Rengên darîştî:

Bi lihevxistina du rengên sereke rengekî darîştî saz dibe û ji bo vê yekê bi navê darîştî hatine binavkirin. Rangên darîştî ev in: **kesk**, **binefşî** û **pirteqalî**.



## Rengên hevbelîker(hevtemamker):

Ji ber ku her rengek ji van rengan, rengê pêşberî xwe di girovera rengan de belî dike ango her rengek hêza rengê pêşberî xwe dide xuyakirin, bi vî navî hatine binavkirin.




Rengê **zer** belîkerê rengê **binefşî** ye.

Rengê **Sor** belîkerê rengê **kesk** e.

Rengê **şîn** belîkerê rengê **pirteqalî** ye.

**Mînak:**

Gava em rengê şîn deynn kêleka rengê pirteqalî yan li pêşberî wî, rengê şîn di pileya xwe ya herî bihêz de xuya dibe.



## RAHÊNAN:

1. **Tu çi di vê kevalê de dibînî? Şîrove bike.**
2. **Rengên di vê tabloyê de hatine bikaranîn, bi nav bike.**

**WANE 4**

# NEXŞEYA ŞÎNATIYÎ

## Armanca hunerî:

**Naskirina xwendekar ji çawaniya xêzkirina nexşeya şînatiyî re.**

## Nexşeya şînatiyî:

Ew nexşeya ku xwe dispêre hêmanên xwezayî mîna giya, pel, gul, dar û fêkî.

## Rêgezên nîgarkirina nexşeya şînatiyî:

1. **Hevsengî:**
   Belavkirina reng û hêmanan bi awayekî birêkûpêk.



2. **Yeksaneyî\sîmetrîkî:**


Di vê cureyê de, her du alî bi temamî wek hev tên.



3. **Kombûn:**

Kombûn dabeşî du cureyan dibe. Ew jî ev in:

- Kombûna ji xalekê: Teşeyên yekaneya nexşeyê ji yek xalê dibişkivin.
- Kombûna ji xêzekê: Weke şînbûna pelên daran ji şaxan û şînbûna qurman. Ev cure ji bo çarçoveyan tê bikaranîn.



## Dubarekirin:

Ji girîngtirîn rêgezên nexşeyê ye. Bi piranî di xwezayê de peyda dibe, wek pel û şaxên daran.



**Li vê nexşeya li jêr baş binêre û bibîne kîjan hêman ji hêmanên nexşeya şînatiyî tê de peyda dibe?**



## RAHÊNAN:

**Nexşeyeke şînatiyî bi rêbazê dubarekirinê nîgar bike û bi rengê ku tu jê hez dikî, reng bike.**

**WANE 5**

# TÎPÊN BI RÊBAZÊ 3D


## Armanca hunerî:


**Naskirina xwendekar ji qebare û teşeyan bi rêya pileyên sî û ronahiyê.**

## Rêbaza 3D:

Rêbaza 3D yek ji hunerên bedew e, ku kûrbûna teşeyê bi rêya bikaranîna pênûsa risas, pênûsên komirî an jî rengan dide xuyakirin û ji çavan re rasteqîn xuya dibe.

**Li van her du nîgaran baş binêre, tu çi dibînî?**








Tu dibînî ku tîp ji paşnîgarê belîtir in?


Tu bi kûrbûna tîpan hest bûyî?


**Ji bo ku em tîpekê bi rêbazê 3D nîgar bikin, divê em van gavan bişopînin.**








## RAHÊNAN:

1. **Hewil bide ku tu bi rêya van xalan, tîpekê bi rêbaza 3D nîgar bikî:**
    - Xêzên destpêkê bi pileya **2H-3H** xêz bike.
    - Cihên siyê bi pileya **3B-4B** sî bike.

**WANE 6**

# NÎGARKIRINA KESAYETÊN ÊNIMIYÊ

## Armanca hunerî:

**Firehkirina aşopa xwendekar di warê nîgarkirina kesayetan de.**


## Nîgarkirina kesayetên ênimiyê ji ku hatiye?

Sedema nîgarkirina kesayetên ênimiyê vedgere ku japoniyan ji kesayetên mezin pir hez dikir, lewma xwestin ku wan weke efsane nîgar bikin û xwe bi wan paye bikin. Paşê ev huner bi sînemaya Amerîkayî re bi rêya lênûsên wênesaziyê, bû wêneyeke bi liv û tevger.

Lê divê em nas bikin ku du cureyê nîgarkirina kesayetan hene, her yek ji wan rêbazeke nîgarkirinê yê taybet pê heye. Ew jî ev in:

1. **Ênimî:** Japoniyan ev rêbaz afirandine ku hûrgilî tê de pir in û kesayetên wê nêzîkî rastiyê ne. Ev cure ne tenê ji bo zarokan e, lê belê hin film ji bo mezinan jî hene ku diramayê di hundirê xwe de dihewînin.
2. **Karton:** Amerîkayiyan ev cure afirandine, bi piraniya xwe ev cure ji bo zarokan e ku hûrgilî tê de paşguhkirî ne.

**Li vê wêneya li jêr baş binêre û cudahiya di navbera her du rêbazan de bibiîne.**




**Ta ku em kesayeteke ênimiyê nîgar bikin, gerek e em van gavan bişopînin:**













## RAHÊNAN:

1. **Hewl bide ku tu kesayetekê nêzî vê kesayeta li jor xêz bikî û bi rengên guncaw rengîn bikî.**

**WANE 7**

# HESP

**Armanca hunerî:**

**Fêrkirina xwendekar ji çawaniya xêzkirina hesp re.**

**Hesp:**


Lawirekî guhandar e ku ji bo siwarbûnê tê bikaranîn. Hesp bi teşe, qebare û lez in û di karînê de cuda ne.

**Bi hûrbînî li vê wêneya hesp binêre, paşê balê bikşîne li ser tevgera gewdeyê wî.**




**Ta ku em hespekî xêz bikin, divê ku em van gavan bişopînin:**


1




2




3




4




5




6



7



8



**RAHÊNAN:**

1. **Hewl bide ku tu bi alîkariya gavên ku me di waneyê de şîrove kirin, teşeya hespekî ku tu jê hez dikî, xêz bikî û bi rengên guncaw rengîn bikî.**

**WANE 8**

# ÇEM

## Armanca hunerî:

**Fêrbûna xwendekar ji çawaniya darijandina çem re.**


## Çem:

Rêyeke xwezayî, ji herkîna avê re ye ku herkîna avê tê de domdar e.

**Li xweşikbûna vê wêneya li jêr binêre û balê bikşîne li ser hevsengiya rengên kesk û şîn.**



**Ta ku em çemekî xêz bikin, divê em van gavan bişopînin:**




## RAHÊNAN:

1. **Hewl bide ku çemekî tu nas dikî xêz bikî û bi rengên guncaw rengîn bikî.**

**WANE 9**

# CEJINA NEWROZÊ

## Armanca hunerî:

**Zêdekirina nasîna xwendekar ji hûrguliyên tiştên derdorê re û dîtina wan, her wiha nîgarkirina wan bi awayekî rast.**

## Cejina Newrozê:

Li Rojhilata Navîn ji cejinên herî kevin e ku hemû gelên herêmê tev li wê dibin. Cejina Newrozê nîşana şkestina hêza zordest û nîşana yekîtiya gelan e, her wiha roja serkeftin û azadiyê ye.

**Li vê wêneya li jêr baş binêre û balê bikşîne li ser tevgera mirovan û hûrguliyên hêmanên xwezayî.**



Rengê zer û yê pirteqalî di wêneya borî de, li gor waneya rengên sar û yên germ, çi hest da te?



## RAHÊNAN:

1. **Hewl bide ku tu dîmenekê ji Cejina Newrozê xêz bikî û bi rengên sereke û yên dariştî rengîn bikî.**

**WANE 10**

# NÎGARKIRINA JI AŞOPÊ

## Armanca hunerî:

**Naskirina karîna xwendekar ji nîgarkirina ji aşopa xwe û tiştên ku jê hez dike, derbarê nîgarkêşiyê de.**

## Armanca perwerdeyî:

1. Avakirina têghaştin û bîrbirina ji çi tiştên berbiçav û pelandî re.
2. Avakirina reftar, derbirîna afrînerî û taybetiyên kesayetî yên girêdayî afrîneriyê.
3. Bîrbirîna têkiliyên xweşikbûnê, di karên hunerî de.

## RAHÊNAN:

1. **Hewldana her xwendekarekê/î ji nîgarkirina mijareke ku jê hez dike re û rengînkirina wê mijarê bi rengên guncaw.**

## ARMANCA PERWERDEYÎ

1.Naskirina xwendekar ji heyberên cuda re, ji bo bidestxistina karên destan.

2.Darijandina ramana kar.

3.Bikaranîna behreyên xwe di sazkirin, pêvekirin û birînê de.

## BEŞA DUYEM KARÊN DESTAN

1. Karek ji Keviran.
2. Xemilandina Hêkan.
3. Teşeyek ji Pelên Qelayê.
4. Xemilandina Dembolekî Bilastîkî.
5. Xemilandina Qapa Lênûsê.
6. Darek ji Têlê.
7. Qotîk û Namedan-ka Diyariyan.
8. Karek ji Hiriyê.
9. Karek ji Darikên Cilan.
10. Mijareke Serbest.



**WANE 1**

# KAREK JI KEVIRAN


## Armanca hunerî:

**Avakirina şarezayiya afirandina gewdeyan û çawaniya bikaranîna wan, di karên hunerî de.**

Em dikarin gewdeyên cihêreng ji keviran û hin amûrên alîkar pê re weke rîbanê, saz bikin û derdora xwe pê bixemilînin. Her wiha em kevalan û binikên çaydanan ji wan çêkin.








## Amûrên pêwîst:

Karton, kevir, rîban û şîrêz.




**Ji bo ku em gewdeyekî ji keviran saz bikin, divê em van gavan bişopînin:**




2


3







**RAHÊNAN:**

**Hewl bide ku tu teşeyekî ji keviran çêkî û bi xemila ku tu jê hez dikî, bixemilînî.**

**WANE 2**

# XEMILANDINA HÊKAN

## Armanca hunerî:

**Firehkirina aşopa xwendekar û danasîna wî bi çawaniya sûdwergirtina ji hêkan, di karê hunerî de.**

Tevî ku gelek sûdên hêkan di xwarinê de hene, em dikarin sûdê ji wan di warê hunerî de jî bigirin; wan rengîn bikin û bixemilînin.







## Amûrên pêwîst:

Hêk, hirî, rîban, têl û pênûsên rengîn.



**Ta ku em hêkê bixemilînin, pêwîst e em van gavan bişopînin:**




2


3


4
DOMS
aqua PENS


5




## RAHÊNAN:

**Hin hêkan bîne û wan bi awayên cuda rengîn bike û bixemilîne.**

WANE 3

# TEŞEYEK JI PELÊN QELAYÊ

## Armanca hunerî:

**Karîna xwendekar ji çêkirina gewde û teşeyên ji pelên qelayê.**

Gelek bikaranînên pelên qelayê hene, di warê xwarinçêkirin, nixumandin û hwd de. Em dikarin di warê hunerî de jî gelek gewdeyên cuda jê çêkin.






## Amûrên pêwîst:

Pelên qelayê, pênûseke reş, cawbir, karton û şîrêz.





**Ta ku em gewdeyekî ji qelayê saz bikin, pêwîst e em van gavan bişopînin:**




2


3


4


5




RAHÊNAN:

**Gewdeyekî ku tu jê hez dikî ji pelên qelayê, saz bike.**

**WANE 4**

# XEMILANDINA QOTÎKEKÊ

## Armanca hunerî:

**Qezenckirin û sûdgirtina xwendekar ji heyberên cuda re.**

Ji dêl ve ku em dembolên bilastîkî biavêjin, em dikarin bi zêdekirina hin heyberên din li wan, sûdê ji wan bigirin û teşeyên nû û xemilê ji wan biafirînin, paşê em dikarin pol û odeya xwe jî pê bixemilînin.







## Amûrên pêwîst:

Qotîk (cam an bilastîk), peleke çirisok, peleke sade, qeseb, hirî, cawbir, firçe û şîrêz (hemû cureyên şîrêzê bi kêr tên).



**Ta ku em qotîkekê bixemilînin, divê em van gavan bişopînin:**




2




3




4


5







## RAHÊNAN:

**Piştî ku te nêrînek li ser xemilandina qotîkan satand, hewl bide ku tu qotîkekê bi teşe û rengê ku tu dixwazî, bixemilînî.**

**WANE 5**

# XEMILANDINA QAPA LÊNÛSÊ

## Armanca hunerî:

**Nasîna xwendekar ji çawaniya xemilandina qapa lênûsê bi heyberên cuda.**

Lênûs, ew amûra ku di hemû qonaxên xwendinê de bi me re weke hevalekê ye, lewma carinan mirov dixwaze wan ji teşeyên wan ê normal derxe û biguherîne. Di vê waneyê de em ê fêrî xemilandina lênûsê bi teşeyeke bedew bibin.





## Amûrên pêwîst:

Pelên rengîn ên çirsiok, peleke sade, cawbir, firçe û şîrêz.



**Ta ku em lênûsa xwe bixemilînin, pêwîst e em van gavan bişopînin**:




2


3



## RAHÊNAN:

**Hewl bide ku tu lênûsa xwe bi teşe û xemileke nû biguherî.**

**WANE 6**

# DAREKE JI TÊLAN

## Armanca hunerî:

**Geşedana şarezayiya xwendekar di warê amadekirina karên hunerî bi heyberên cuda.**

Em dikarin sûdê ji têlan bigirin; wan derbasî karên hunerî bikin û daran ji wan çêkin.







## Amûrên pêwîst:

Têl û morîk.




**Ji bo ku em gewdeyekî ji têlan saz bikin, pêwîst e ku em van gavan bişopînin:**









5



**RAHÊNAN:**

**Hewl bide ku tu bi hevalên xwe re darekê ji têlan li gorî van gavên ku me di waneyê de şîrove kirine, saz bikî.**

WANE 7

# QOTÎK Û NAMEDANKA DIYARIYAN

## Armanca hunerî:

**Geşedana şarezaya xwendekar di warê bikaranîna karton û pelên rengîn di sazkirina karên hunerî de.**

Diyarî; rêyek ji rêyên derbirîna hezkirin û pîrozkirina boneyan e. Di vê waneyê de em ê fêrî çêkirina qotîk û namedanka diyariyan bibin.








## Amûrên pêwîst:

Peleke zer, cawbir, pênûsên rengîn, rîban û şîrêz.




**Ta ku em peyamdankeke diyariyan saz bikin, gerek e em van gavan bişopînin:**


**1**

2



3



4



5



## RAHÊNAN:

**Piştî ku te nêrînek li ser çêkirina pyamdankê stand, hewl bide ku tu bi rengê ku tu jê hez dikî, peyamdankekê çêkî, paşê diyarî heval û mamoeteyên xwe bike.**

WANE 8

# KAREK JI HIRIYÊ

## Armanca hunerî:

**Naskirina xwendekar ji çawaniya bikaranîna hiriyê re.**

Ristina hiriyê, yek ji pîşeyên kevinar e ku heya dema îro berdewam e. Armanca ristina hiriyê, bidestxistina cilên germ ji bo xweparastina ji sermaya zivistanê ye. Ji bilî cilan, em dikarin di warê hunerî de jî teşeyên cuda jê saz bikin, çi ji bo dîkor an jî ji bo raxistekên malê be.





## Amûrên pêwîst:

Du gilokên hiriyê (Pembeyî û spî), cawbir û derzî.



**Ta ku em teşeyekê ji hiriyê çêkin, pêwîstiya me bi şopandina van gavan heye:**




2


3


4


5


6







## RAHÊNAN:

**Piştî ku tu fêrî çawaniya çêkirina gilokên ji hiriyê bûyî, hewl bide ku tu teşene nû pê saz bikî.**

WANE 9

# KAREK JI DARIKAN

## Armanca hunerî:


**Firehkirina aşopa xwendekar di sûdgirtina ji tiştên xwezayî yên li derdora wî û bikaranîna wan.**

Ji bilî ku dar xweşikbûneke bêhempa ji me re peyda dike, em dikarin karine hunerî ji şaxên wê çêkin.




## Amûrên pêwîst:

Kartona hêkan, kartona normal, şîrêz, cawbir, şaxên daran û rîban.




**Ji ku em gewdeyekî ji darikên cilan çêkin, pêwîstiya me bi şopandina van gavan heye:**





2


3

4




5



6



**RAHÊNAN:**

**Hewl bide ku tu kevalekê ji şaxên daran û hin hêmanên din (pelên daran, rîban an jî çi hemaneke ku tu jê hez dikî) lê zêde bikî.**

**WANE 10**

# MIJAREKE SERBEST

## Armanca hunerî:

**Geşedana şarezayiya karên destan li gel xwendekaran.**

Çêkirina rojane ji karên destan re, dihêle ku em nirxên xweşikbûnê di rêya girêdana di navbera xweza û karên şêwekariyê de baş nas bikin. Her wiha me bi heyberên derdora me dide nasîn û çawaniya sûdgirtina ji wan.







## RAHÊNAN:

**Mijareke ku tu jê hez dikî hilbijêre û bi reng û xemila ku tu dixwazî pêk bîne.**

# Belavkirina Waneyan Li Ser Sala Xwendinê

| Heftî / Heyv | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | **Nîgarkirin bi Rêya Pênûsa Risas** | **Xwezaya Bêdeng** |
| Cotmeh | **Xwezaya Bêdeng** | **Rengên Hevbelîker** | **Nexşeya Şînatiyî** | **Nexşeya Şînatiyî** |
| Mijdar | **Tîpên bi Rêbaza 3D** | **Karek ji Keviran** | **Xemilandi-na Hêkan** | **Teşeyek ji Pêlên Qelayê** |
| Berfanbar | **Xemilandi-na Qotîkekê** | **Xemilandi-na Qotîkekê** | **Xemilandi-na Qapa Lênûsê** | **Xemiland i-na Qapa Lênûsê** |
| Rêbendan | Lêveger | Lêveger | Bêhinvedan | Bêhinveda n |
| Reşemeh | **Nîgarkirina Kesayetên Ênimiyê** | **Hesp** | **Çem** | **Cejina Newrozê** |
| Avdar | **Cejina Newrozê** | **Nîgarkirina ji Aşopê** | **Darek ji Têlan** | **Darek ji Têlan** |
| Cotan | **Qotîk û Peyamdanka Diyariyan** | **Karek ji Hiriyê** | **Karek ji Darikan** | **Mijareke serbest** |
| Gulan | Lêveger | Lêveger | | |